

**Erdogan bi eşkeryî rûye xwe rastî nîşan da;**

**"Emê perwerdeya bi Kurdî nehêlin ku pêk were"**



**AMED, bakûrê Kurdistanê --** Serokwezîrê Tirkîyê Erdogan di mitînga partiya xwe ya li Afyon-karahîsarê bersiv da axaftina Hevserokê DTPê Ehmet Tirk a bi Kurdî.

Erdogan, Ehmet Tirk bi derxistina krîzê gunehbarkir û got, ew ê destûrê nedin ku Kurdî bibe zimanê perwerdê.

Erdogan di axaftina xwe de îdîa kir ku ew bikaranîna zimanan weke dewlemendiya çandî dibînin û axaftina Turk a bi Kurdî weke şovê binav kir.

Serokwezîrê Tirkîyê DTP'e jî bi gurkirina şer û tengezariyê gunehbar kir û dubare got, her kes dikare bi zimanê xwe biaxive.

Erdogan diyar kir ku hin kes li dijî rêzîknameya Meclîsa Tirkîyê derdikevin û bi zimanên din diaxivin û îşaret bi DTP'ê kir.

Erdoğan di axaftina xwe de wiha got, "Hin kes dibêjin bila Kurdî bibe zemanê perwerdê. Nexêr wê ev yek bi cih neyê." û bi van gotinan rastiya xwe eşkere kir.

**Naxwazin Kurdî bigehêje statuyeye fermî**

Niyeta AKP'ê ya xapandina kurdan di pratîka wê ya demên dawî de jî bi awayekî zelal derketîye holê. Ji aliyekê ve bi navê TRT 6 kanaleke qaşo bi kurdî vedike, ji aliyê din ve jî her roj doz li zimanê kurdî vedike.

Li girtîgehan girtîyên ku bi malbatên xwe re bi kurdî diaxivin ceza dike, rojname û kovarên kurdî digire û li Meclîsê axaftinên kurdî wekî 'zimanê nayê zanîn' dide qeyd kirin.

Ev hemû jî rewşa polîkayên AKP'ê radixe ber çavan. Ji bo AKP samîmî be divê zimanê kurdî bigihîne ewlehiya Makezagonî û wekî zimanê fermî qebûl bike.

### **Şîrove - HAWAR NET: Bi wan gotinan derket holê ku TRT 6 ne ji bo berjewendiya Kurdan e**

AKP ku ji ber neçariyê weşana kurdî dandest pê kirin, behsa beşa kurdolojiyê dikin lê dema kurd zimanê xwe bikar tînin tîn ceza kirin. AKP bi vê bûyere careke din rûyê xwe rastî nî nîşan da. Ger li Tîrkiye ser zimanê Kurdî zordarî û pêşî lê girtinên mezin nebûya dibe ku vebûna kanala Kurdî wek gaveke ji dil û bo berjewendiya Kurdan bihata şîrove kirin.

Lê wisa xuyaye ku dewlet û hikumta AKP li pêy xapandina Kurdan e. Vebûna kanala Kurdî bo têk birina zihniyeta înkara Kurdan a dewleta Tîrk de gaveke mezin e, lê ji vê zêdetir bo Kurdan feydeya vê kenalê nîne. Heger dewleta Tîrk serbest kirina zimanê kurdî de ji dil be û berjewendiya Kurdan difikire û naxwaze zimanê kurdî lawaz be divê gelek gavên din bo serbestîya zimanê kurdî bavêje.

Dewleta Tîrk li hemberî rastiya zimanê Kurdî, rastiyan roja me û têkoşîna kurdan neçar ma ku di televiyona dewleta Tîrk a TRT de kenalake taybet bi zimanê kurdî veke. Lê aliyê din de jî qedexe û zextên ser zimanê kurdî didome û ev yek jî dibe sedema gavên dewleta Tîrk wek gavê xapînok were dîtin. Wisa xuyaye ku dewlet û hikumta AKP li pêy xapandina Kurdan e.

Li gel ku dewleta Tîrk di gelek qadan de zimanê Kurdî qedexe dike jî kurd pêy hev çalakî û kampanyên xurt bo zimanê Kurdî pêk tînin. Zext û qedexeyên li ser Kurdî her roj yê nû zêde dibin.

Dozgerên dewleta Tîrk derbarê bikaranîna zimanê kurdî di 2008'an de bidehan doz vekirin û ji gelek kesan re ji ber bikaranîna zimanê Kurdî ceza hate birîn. Erdogan bi wan goinên xwe careke din nîşan da ku armanca wan ne dayina mafê Kurdan e û pêşketina zimnê Kurdî ye. Armanca kontrol kirina Kurdan e lê bi zimanê Kurdî. (*Dîha, Hawar Net, ajansan*)